Di Dilê Zivistanê da Bihara Azadiyê

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Ew sal û roj ji bîra kesî naçin. Dîrok qet wê rojê ji bîr nake. 34 roj ji çileya mezin a zivistana sala 1946an derbas bibûn. Ji rojên heftiyê sêşemî bû. Saetê xwe digehande 11.00ê berî nîvro. Qada Çiwarçira li navenda bajarê Mehabadê çend roj bû ku bi alên Kurdistan û KDPê hatibû xemilandin. Herkesî dizanî ku di welatê wan da jiyan yê derbasî qonaxeke nû bibe.
Mêvan li bajar pir bûn. Ji xeynî roja ku şervanên Simkoyê Şikak bajar ji destê jandarmên Riza Pehlewî rizgar kiribûn, tikeskî ewqas mirov li bajarê Mehabadê nedîtibûn. Ji wê rojê 25 sal derbas bibûn û şûndatir kesî tama azadiyê nekişandibû. Di çavên herkesî da keyfeke mezin û hezar gotinên veşartî xuyabûn. Pîrejineke 80 salî bi pişta çemiyayî û gopalê xwe yê dar ber bi qada Çiwarçira ve dimeşî. Hêdî-hêdî pêngavên xwe hiltanîn, carna pişta xwe ya tewandî rast dikir û dipirsî:" Ka ew li kûye?"
- Kî?, tu kê dixwazî dapîr?
-Pêşewa, ew li kûye, dixwazim ji nêzve wî bibînim...!
Endamekî komîta navendî ya KDP dengê pîrê bihîst. Destê wê girt û ber bi qada Çiwarçira bir. Yekrast ew gehande cem Pêşewa Qazî. Dayika 80 salî li wî nêrî û bi hêsirên ku weke barana biharê li çavên wê dibarîn wiha got:" Rolegiyan, Pêşeway mezin û azîzman, baş bû ke nemirdim û azadî Kurdistanim dît. Du kurim şerkerî qaremanî Kurd Simkoyê Şikak bûn, bo Kurdistan şehîd bûn. Êsta hatûm ke le jêr alay Kurdistan da minîş bibime pêşmerge.... wezîfem çiye rêberî gewrem?!"

Vê gotinê Pêşewa veciniqand. Çavên wî tejî bûn. Demekê bêdeng û sûsretgirtî li qormiçkên rûyê pîrê temaşe kir. Baş li rûyê wê û destên wê yên lerzok nêrî, xwe çemand û xwest detsê wê yê rastê maç bike, lê şêre jina pîr nehişt û nava çavên wî maç kir, bi dengekî bilind dîsa jêra got:" Îro hesret û xweziyên sedan salan gehiştin encamê. Êdî mirin bila bixêr bê. Ezê vê mizgîniyê ji kurên xwe ra bibim dinyaya din..."
Dîmenekî wiha bandoreke mezin li ser herkesî danî. Bû hêzeke mezin û herkes şakir ku jineke Kurd bi vî awayî bi doz û pêşewayê xwe ve girêdayî ye. Hingî general Heme Husênxan Sêyfê Qazî(wezîrê şer) li derdora xwe nêrî û wiha got:" Min îro zanî ku êdî ne mumkine Kurd dest ji doza xwe berden, rojekê yê bê ku hemû axa Kurdistanê azad bibe...".

Qazî Mihemed di nava dilê civakê da xwedî cihekî taybetî bû. Wê rojê ew bi dirêjî li ser dîroka serhildanên Kurdistan û serokên şehîd axivî. Kurdên çar parên Kurdistanê li dora xwe didîtin. Ew wê rojê wiha qêriyabû:" Ev Kurdistan mala hemû Kurdekî ye..." gotin xwedî wate û felsefeyeke kûr bû. Sewiya rewşenbîriya serokkomarê Kurdistanê dida xuyanîkirin. Zaten di deftera wî ya kar da xerîta "Kurdistan mezin" bala herkesî dikişand. Qazî wê rojê bû serokkomarê Kurdistanê û bi evîneke mezin dest bi karên xwe yên dîrokî kir. Di wê roja pîroz da ew bi dirêjî li ser rewşa siyaseta Îran, Kurdistan û cîhanê agehî dan xelkê û gel şiyar kir ku:" yekîtiya di navbera xwe da bihêztir biken û xiyanetê li gel û welatê xwe neken..."

Li ser Kela Dim-dim û mêrxasiya Emîrxan axivî. Behsa pêşngên Kurd li Kurdistana mezin kir. Bi vêra xwest ku hinek şiûra Kurda ya netewî ji xewa giran şiyar bike. Wan bi hebûna wan bihesîne Xwest ku şexsiyeta Kurda ya hatî sivik kirin, zindî bike. Gotinên wî wisa li ser hissên xelkê bi bandor bûn ku hêsirên gelek ji wan dihatin xwarê.

Temenê komarê kurt bû, lê destkeftên wê pirin û heya roja îro jî Kurd bi serbilindî wê sala dîrokî bi bîr tînin.
Kurdistaneke serbixwe û xwedî serokkomar, kabîneya wezîran, ala rengîn, marşa netewî, artêşa gel, Pêşmerge, çand û edebiyata taybetî, şaêrên milî, rojname, radio, çapxana Kurdistan, perwerde bi zimanê zikmakî, yekîtiya jinan û ji her tiştekî girîngtir welatekî demokratîk tev ji destkeftên komara Kurdistanê bûn.

Kes nikare înkar bike ku rayedarên komarê bihayekî giran didane pirensîpên demokrasiyê. Dema du komarên Kurdistan û Azerbayicanê.bi hevra bêne qiyaskirin, hingî heqîqet baştir tên kifşê. Kurda liyaqeta xwe ya xweîdarekirinê bi herkesî dan selmandin. Elbete dewleteke serbixwe li ser axa Kurdistanê ya tejî kan û petrol, ji welatên cîran ra tehdîdeke mezin bû. Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriye weke ku îro em dibînin, ketin nava liv û lebateke berfireh. Nameyên ku wê salê wezareta derve ya Tirkiyê bi awayekî fermî ji rayedarên Îranê ra nivîsandine, tev bi wê armancê hatine şandin ku rojekê ji roja din zûtir gere ev komar nemîne û pêşniyar diken ku ew amadene bi hemû şêweyan hevkariya wan bikin û komara Kurdistan weke nokekê bavêjin binê heft behra.

Xalên ku mirov dikare li ser cihê komara Kurdistan yê taybetî di dîroka Kurdistanê da binav bike, evin:

1- Zinbdîkirina şexsiyeta Kurd ji hêla xwe ya nefsî(piskolojî) ku dîktatorekî mîna Reza Pehlewî li pey têkçûna şoreşa Simkoyê Şikak bi hezar şêweyan tehqîr kiribû. Beriya wê Kurd weke wehş, cahêl û dijminên bajarvaniyê dihatin binavkirin. Hilanîna vê pêngava dîrokî bû sedem ku hissa "bi xwe baweriyê" di nava Kurdan da mezintir bibe.
2- Kurda ji dost û dijiminên xwe ra dan selmandin ku dikarin heta di rewşeke aborîya ya xerab da jî welatê xwe birêve biben.
3- Pêşewa Qazî bi pirensîpên xwe yên taybetî ji gel ra mîna bavekî dilovan bû. Wî dixwest xwedî hikumetekê be ku li ser dilan hukim bike û komareke demokratîk be. Xebatên wî yên dîplomatîk saman û mîrasekî giranbuha ji dîroka mera kirin mal.
4- Bi avabûna komarê ra maşîna asîmîlasyona ku gelên serdest li dijî hebûn û hemû û taybetmendiyên Kurda yên netewî bi rê xistibûn, hinek ji hereketê sekinand.
5- Bi derketina roja komarê tiştek bi navê "Pirsgirêka Kurd" baştir ji berê rûyê xwe yê rastîn li Îran, Sûriyê, Tirkiyê û Îraqê derxist ber ronahiyê.
6- Demokrasiya ku serûkaniya xwe ji bîr û ramanên Pêşewa Qazî Mihemed yên berfireh distand, ger derfeteke zêdetir jêra çêbibûya, dikarîbû bibe remza rizgarî û kilîla zindana ku hikumetên totalîter û dîktatorên xwînrêj ji gelên herêmê ra durist kiribûn. Vê komarê û semîmiyeta di navbera gel û desthilatê da, Mehabad kire qibleya azadîxwazan.
7- Xiyaneta "welatê şiwrê" careke din bi bîra me anî ku pêwîste beriya herkesekî mirov pişta xwe bi hêzên biyanî germ neke. "Soveyet"a ku mîna bûhêştekê ji bexteweriya

gelên cîhanê ra hatibû wesfkirin, bi dijberên azadî û dîktatoran ra li ser masekê rûnişt û her du komarên Kurdistan û Azerbayicanê kirin qûrbana çend protokulên aborî-siyasî. Xiyaneta ku me di salên 1880, 1920, 1946, 1975an dît û heya roja îro jî berdewame.

8- Jin bo cara yekê bûn xwedî wî mafî ku di civakeke feodalî da "yekîtî afretanî Kurdistan" pêk bînin. Axa, beg, şêx û meleyên paşvero li dijî vê biryarê "fetwa" dan û dijayetiya xwe ya li hemberî komarê û Qazî Mihemed dan xuyanîkirin. Lê serokkomar çû nava wan, bi wan re ket nava behs û minaqişeyên dûr û dirêj. Li mizgefta Ebbas Axa heft roja bi hevra ketin nava şiwir û axaftinan. Pêşewa hêdî-hêdî bi mentiq û felsefeke kûr hemû dijberên xwe razî kirin ku jin û mêr li gor hemû zagonên komarê û di bin ala Kurdistanê da xwedî mafên wek hevin.
9- Hatina nemir Mistefa Barzanî ji başûrê Kurdistanê û piştgîriya ku bi hêza xwe da komara Kurdistan, weke wê hindê bû ku du lîderên Kurd hemû peymanên ku axa wan kiribûn çar parçe, çirandibûn. Sinorên sîyasî li ba wan bêqîmet û wate bûn û Qazî çendîn cara gotibû:" Kurdistan mala hemû Kurdekî ye..." Hêza Barzaniyan di hemû temenê komarê da hem şervanên baş û hem jî bibûn sebeba dilgermiya xelkê.
10- Komar di çilê zivistaneke sar da hat îlankirin, lê di dilê wê sir û seqemê da biharek bixwe ra anî ku hemû salê ew bîranîna pîroz wek cejin û şahiyekê ji hêla Kurdên Kurdistana mezin ve tê bibîr anîn. Vê bîranînê tirseke mezin di di dil û mejiyê neyarên Kurd da çêkiriye û dihêle ku Kurd her salê ji salên berê baştir lîderê xwe Pêşewa Qazî û komara Kurdistan binasin. Ew bihar hemû salê li me dibe mêvan û êdî bûye efsaneyek û kete nava hemû dilan.
11- Dema ku dengê her du rêxistinên Hîwa û Xweybûnê li başûr û bakurê Kurdistanê namîne, vê carê li rojhelatê Kurdistanê li pey girêdana peymana "sêsinor" li ser çiyayê Dalanper Komeley "Jiyanewey Kurd-J.K" li Mehabadê riheke nû dide laşê doza Kurdînîyê. Serkêşê karwanê doza bi şan û şerefa Kurdistanê vê carê Pêşewayê rewşenbîr û canfîda, Qazî Mihemedê jîr û siyasetemedare.

Bi giştî wek nemir Elî Gelawêj di helbesteke xwe da dibêje:
"Em xake yek roj bêşoreş nebû
Kurd niwêjî çûbê, şoreşî neçû"
Dema ku li bakurê Kurdistanê serhildana Seyîd Rizayê Dêrsimî(1938) ji hêla Kemalîstên faşîst ve bi agir û hesin hatibû temirandin, li rojhelatê Kurdistanê serok û qehremanê mezin Simkoyê Şikak di çaxê hevdîtinan da hatibû şehîd kirin(1930), şoreşa serokê navdar Mistefa Barzanî bi hevkariya Ingilîzan li başûrê Kurdistanê hatibû hilweşîn, li Mehabada qehreman perwer komarek şên bû ku jiyana siyasî li Kurdistanê derbasî warekî nûtir kir. "Xweybûn" û "Hîwa" nemabûn, lê J.Kê rêya wan domand û gula komarê li pareke axa Kurdistanê bêhna xwe gehand difna hemû azadîxwazên herêmê.


28. Qazi Muhammad in his office at the time of Captain Roosevelt's visit (September 1946)

Mîrên Bedirxanî, Şêxên Şemzînî, Mîrên Rewandizî, Şêxê Pîran, efsaneya kela Dim-dim û hezar hîvîyên ku di singê wan da hatibûn kuştin, wê rojê li Mehabadê şên bûn û xwe gehandibûn hev. Tîrêjên rojeke germ wê zivistanê rengê jiyan guherandibû.

Rojekê Simko û Şêx Mehmîdê Berzencî, piştra Qazî Mihemed û Mistefa Barzanî destê xwe dabûn hev û moraleke siysaî û nû di riha nîv mirî a mirovê Kurd da afirandibûn. Jiyan û mayîna Kurda heya roja îro wiha berdewam bûye û sal bi sal xweştir dibe.

Rûdanên li çar kenarên Kurdistanê hinek azomon û pirensîp ji mera tomar kirine. Dîrok hikayet û çîrok nîne, belkî gencîneya prensîp û azmonên netewekêye. Partî, rêxitin, sazî û kesên ku biryara çareserkirin an jî gûherandina qedera Kurda didin, ger ev pirensîp û helwest pêş jî nexistibin, qe nebe gere wek mîrasekê wan biparêzin.

Gelo çima komarek bi van hemû sifetên baş têkçû? We qet ji xwe pirsiye: Gelo em Kurd çima hê nebûne xwedî dewlet?!...Ger ji min bipirsin:
Bêhêziya bîr û ramanên netewî, hesûdî, xiyanet, cehşatî, nebûna yekîtiyê di navbera me da, neşehrezayî derheqa dîroka serheldanên Kurda yên berê, bawerî bi dijimin, kultura eşîret, xêl û êlatiyê, berjewendiyên takekesî li jor hemû berjewendiyên millî û civakî, lawaziya ferhengî û hewldanên neyaran li dijî pêşketina Kurda û sivikkirina nirxên ku bi dîroka Kurdistanê ra hatine afirandin û...tev ew faktorin ku em bindest hiştine.

Armancên bilind û pîroz bi avabûna komara Kurdistan ra dihatin ku biser bikevin, lê şansekî wiha vê carê jî ji destê Kurda derket. Lê ew sala xweş bû destpêka guherandineke girîng di dîroka serhildanên me da. Qazî Mihemed bû sembola berxwedana gelê Kurd li herêm û cîhanê.
64mîn salroja damezirandina komara Kurdistan li we, gerîla û hemû azadîxwazên Kurdistan û cîhanê pîroz be.